



# COVID-19: Derbasî bo Alîkariya Zaroka

Despêka Perwerdahîya Zaroktiyê û Pakêta Alîkarî ya Lênihêrîn (Pakêta Alîkarîyê) heta roja 12 ê Tîrmeh a 2020'î hatîye dirêjkirin bo ji bo yarmetî bo kargûzarîyan bi hêz biminin pişgirî bo malbatên xebatkarên pîrêwîst û zarokên xizan bête pêşkêşkirin.

Yarmetî ya Lênihêrîna Zaroka / (Child Care Subsidy (CCS) û Yarmetîya Zêde ya Lênihêrîna Zaroka / (Additional Child Care Subsidy (ACCS) wê ji 13'ê Tîrmeh a 2020 şûda ji nûve li gel hin testên çalekîyên rihet bo malbatan û Dravên Veguhastinê a nû ji bo pêşkêşvanan. Ev yeka tê vê watê ji 13 Tîrmeh a 2020 şûda wê malbat dest bi dayîna beşê hevkarîya xwe bo xercê lênihêrîna zaroka bikin.

Malbatên kû ji ber encama COVID-19 ku dema çalekîyên wan hatibûne kêmkirin dê bikaribin yarmetîyek bo awana qasî 100 seatî ji serê her dû hefta carek heta 4'ê Cotmeh a 2020 bête kirin. Bo gihîştina vê yarmetîyê, divê malbat asta çalekîyên xwe li gel Services Australia nûve bikin. Ev yeka bi rêya Hesabê Internetê Centrelink/ [Centerlink online account](#) bi rêya [myGov](#) an ji [Express Plus Centrelink mobile app](#) were kirin.

Zêdeyî, Dravdayîna Derbasîyê wê bê dayîn bo hemî pêşkêşkarên pejirandî ku berê CCS werdigirtin, li tev ew kargûzarîyên ji alîyê wîlayet, herêm û meclîsên herêmî da têne xebitandin.

Dravdanî yê Derbasîyê wê li ser bingeha ji sedî 25 cent li hempa hatinên heqê karûbaran an bi gor rêjeya serseat a vêgavê ye, kêja ji wan kêmtir be, di çarçova heyama referansa têkildar. Ev yeka her ew heyama referansê ye ku di wexta Pakêta Alîkarîyê da hatîye bikaranîn ( dû heftên berîya 2'ê Adar a 2020, û bo ew kargûzarîya lînêrîna betlaneyê bi tenê pêşkêş dike di dema di navbeyîna Demajo'ya 3 û Demajo'ya 4 di sala 2019 da).

Diravdayîna Derbasîyê wê bê dayîn ji bo heyama 13 Tîrmeh a 2020 ta Îlon a 2020.

Bo bi destxistina Diravdayîna Derbasîyê, kargûzarî divê bi bedewamî ew karmendên kû berê kardikirin an miasê JobKeeper werdigirtin di dawîya heyama Pakêta Alîkarîyê disa li ser karên xwe biminin. Ev kargûzêr, rada xercan wek di heyama refransa têkildar kû ( li jor )kû hatîye dîyarkirin bimîne.

Destjêrberdan a ji JobKeeper wê 20'ê Tîrmeh a 2020 de wê destpêbike bo ew karkerên kargûzarîya ji alîyê CCS da hatîye pijirandin û karsazên yekane ên lênêrîna zarokan dixebitîne an perwerdê û çavdêrîya pêşkêşî karmendên lênêrîna zarokan dikin dikin.

Bo agahdarîya zêde bikevin malpera Daira Şarezarî ya Perwerdê û Kardarî / Department of Education Skills and Employment [webpage](#) an Despêka Perwerdahîya Zaroktiyê û Care COVID-19 [Frequently Asked Questions](#).

Hûn herweha dikarin [subscribe](#)/ abona xwe bi email'a nûçename ya dayîra despêka perwerdahîya zaroktiyê çêbikin.